

folklorame

Zargotin pişt e, folklor her tişt e!

Hejmara 7. | Îlon • Çirîya Pêşîn • Çirîya Paşîn 2020

Biha: 15₺

Ferhenga tematîk ya hasil û
mitbexê (Bajarê Agirîyê), Fatma Şahîn
Biwêjên gundê Çîçikayê-2, Bêrivan Matyar
Şerbeta rihanê, Asmîn Üyanik

Titûn, Zîya Mukrîyanî
"Hikayeta Durnas û Hespnas û Mîrnas"ê, M. Emînê Botî
Qaydeyê xerîbê ji Qelqelîyê, Mehmet Yıldırımçakar
Tizba mîr, Kurdjan Sorî



Hejmara 7. | Îlon, Çirîya Pêşîn, Çirîya Paşîn 2020





Zarbêj Memîxan, (1941 -)

Zarbêj Memîxan, di sala 1941ê da li gundê Bayîsa Elbakê hatîye dinyayê. Paşê wê şû kirîye çûye Colemêrgê gundê Kiromê û ji wir jî çûye gundê Zerenîyê. Dayîka şeş kur û du keçan e. Di wextê xwe da siwareka zîrek bûye, ku bi hespî çûye zozan û çîyayan. Gelek caran cîran û gundî ji bo guhdarkirina çîrok û metelokan diçûne lalê Meta Memîxanê. Herweha gelek yarîker e jî û ji bo her kesî jî leqabek heye li cem wê.

folklorame



Iskan Altin

folklorame

Seyîdxanê Boyaxçî
1933-2020



folklorame



SPAS JI BO
ALÎKARÎYA WAN
Aydin Batur
Aşşîn Abdulbarî
Beroj Mukrîyanî
Bîlal Guldem
DÎHA
Dûrzan Cîrano
Eşref Boluncû
Ferhat Arslan
Îskan Altin
Mazlûm Sîyabend
Mûrat Adiyaman
Orhan Tanhan
Refîk Tekîn
Selmet Guler
Tehsîn Baravî
Ugur Sermîyan
Zeynep Yaş
Zozan Gûçlû

TÊKILÎ

folklorame@gmail.com

folklorame



Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpîrsiyar e.

Kovara folklorê ya sê mehane

Sal: 2

Hejmar: 7

Xwedî: Li ser navê Weqfa Mezopotamyayê, Selîm Olçer

Berpîrsa Nivîsan: Gevrîye Atli

Edîtor: Eşref Keydanî

Redaksîyon: Evîndar Şevîn

Desteya Weşanê:

Celîlê Celîl

Bêrîvan Matyar

Elîf Gunduz

Mem Mukrîyanî

Zîya Mukrîyanî

ISSN: 2667-6443

Grafîk: Sevînc Adiyaman

Fotoyê bergê pêş: Mûrat Adiyaman

Fotoyê bergê paş: Dûrzan Cîrano

Navnîşan: Weqfa Mezopotamyayê

Mezopotamya Eđitim Bilim Sanat Sađluk ve Kùltùr Vakfı

İktisadi İřletmesi

Urfa Yolu Üzeri, Serhat Plaza A/blok

Kat: 11 No: 29 Kayapınar/Diyarbakır


Sertifika No: 42382

Çapxane: Aliođlu Matbaacılık Bas. Yay. ve Kađ. San. Tic. Ltd. řti.

Orta Mah.Fatin Rùřtù Sk. No: 1-3/A Bayrampařa-İstanbul

Tel: 0212 612 95 59

Sertifika No: 16919



Pirtûka pêşnîyazkirî

Navê pirtûkê: Ji dengbêj Fadilê Kufragî
destan û çîrokên kurdî
Berhevkar: Hogir Berbir
Weşanxane: Enstîtuya Kurdî ya Amedê



Naverok

5. Ji edîtorî
7. Zûzaq, **Ayela Zarto**
9. Ferhenga tematîk ya hasil û mitbexê (Bajarê Agirîyê), **Fatma Şahîn**
16. Du hîkayet ji Herêma Garisanê, **Eşref Keydanî**
19. Hin gotinên pêşîyan ji Anatolîya Navîn, **Beroj Mukrîyanî**
22. Rista pîrik û makê di listikên zarokan da (Herêma Silopyayê), **Egîdê Fêro**
36. Biwêjên gundê Çîçikayê-2, **Bêrivan Matyar**
38. Çîroka Papûkê, **Mahîr Ugur**
41. Xaçepirsa folklorê, **Oktay Altûn**
42. Nêçîrvan, **Elîf Gun**
48. Şerbeta rihanê, **Asmîn ûyanik**
50. Pîya mêyofxwee, **Hîkmet Yildiz**
54. Titûn, **Zîya Mukrîyanî**
59. “Hîkayeta Durnas û Hespnas û Mîrnas”ê, **M. Emînê Botî**
63. Liwa qole, **Surya Human**
64. Giftûgoya Mîrê Bota û Axaokê Bêdarî
(Ji arşîva ‘Ebdureqîb Yûsîfî), **Hêmin Omar Ahmad**
66. Qaydeyê xerîbê ji Qelqelîyê, **Mehmet Yildirimçakar**
69. Rovî û mele, **Vîldan Sevîm**
71. Dulav reng-reng dulav şeng-şeng, **Aydin Batur**
74. Danasîn û nirxandina “Bilbilhezare”yê, **Evîndar Şevîn**
77. Ferhengoka Agirîyê-3, **Firat Keklîk**
80. Tizba mîr, **Kurdjan Sorî**

Ji edîtorî

Dem û demsal mîna avê diherikin û diçin; dan dibin roj, roj dibin hefte, hefte dibin meh û demsal. Piştî havîneka kelegermî payîza pirreng bi xêr û xweşî hat. Li gel xêr û bêr û xweşîya xwe, bi xwe ra hejmareka din ya Folklorê Me jî anî. Hejmara heftê, li ber destên we ye.

Malûm e dinya ye, carinan hesabê mal û sûkê ji hev nagire. Mirov rêyekê datîne û deh rêyên din jî li wê rêyê zêde dike; lê kar û barên dinyayê fetleka wisa dide mirovî ku mirov rê û dirban şaş dike. Rêya rast li ber mirovî dibe kend û kortal, karê hêsan li ber dibe zor û zehmet; bihar dibe payîz, havîn dibe zivistan. Covîd-19ê fetleka wisa da mirov û mirovahîyê ku ev salek e em jî ketine gêjgerîna wê û nema dikarin derkevin. Lê axir bi derengî be jî meqsed û miradê me bû û kovareka nipînû û têt û tijî amade bû.

Di kar û barên qada folklorê da, gelek xal û binxalên giring hene lê ya herî giring û esil karê berhevkarîyê ye. Bi qewlê folklorîstê kurd Celîlê Celîlî gotî, “*ku berhevkarî tune be yên din -karên din yên folklorê- yek jî bi kêrî tiştêkî nayê.*” Çi li ser malperên medyaya civakî be, çi li ser blog û hesabên şexsî û komî be, çi jî bi agahîyên rasterast be, em dibînin ku hişyarîyek û eleqeyeka mezin ji bo berhevkarîyê çêbûye. Em bi qurbana we bin, xwe sist nekin, xwe li karê xwe bişîndînin, ji behra bêbinî -folklorê kurdan- em çiqas bidin hev jî kêr e. Nebêjin welah min evqas kir û bes e; heyf e, xebînet e ku em zêr û zîvên vî milletî bihêlin di nava axê da, di nava toz û gemar û qul û quncikên mezêl û xanîyan da. Bav û bapîran, dê û dapîran heta nivşê me anîne, em jî xîret bikin ku bigihîjînin zarok, nevî, neviçîrk û neviçîrkên xwe.

Di vê hejmarê da hin nivîsên me hene ku domahîkên nivîsên hejmarên borî ne. Nivîsa “*Biwêjên gündê Çîçikayê-2*” ya Bêrîvan Matyarê yek ji wan nivîsan e. Nivîsa din jî “*Ferhengoka Agirîyê-3*” ye ku ji pênuşa Firat Keklîkî nizilîye. Rêzdar Hêmin Omar Ahmadî, dîsa berê xwe daye arşîva folklorên kurd Ebdulreqîb Yûsifî û du meselokên Cizîra Botanê ji me ra neqil kirine. Ayela Zartoyê ji nava gîyayên herêma xwe îcar qala Zûzaqê kirîye û wê nivîsa xwe bi agahîyên ji devê niştecihên herêmê û palpiştên zanistî kemilandîye.

Berhevkarên me yên hêja û dilsoz; Hîkmet Yildiz, Aydın Batur, Kurdjan Sorî û Elîf Gunê zend û bendên xwe badane û ketine pey çîrokên herêmên xwe. Herweha Mahîr Ugurî jî varyante-

ka “*Çîroka Papûkê*” ji bo we peyda kirîye lê di vê varyantê da cudatîyek mezin heye, bila haya we jê hebe. Mehmet Yildirimçakarî jî li Herêma Qelqelîyê li ser cureyekî taybet yê edebîyata gelêrî ya kurdan berhevkarîyeka baş kirîye û pêşkeş kirîye. Surya Human û Vîldan Sevîmê jî du çîrokên li ser rovîyî berhev kirine û her yek ji wan bi zaravayekî kurdî ye.

Bi xêr û xweşî, bi tevn û teşî be ji me û milletê me ra. Heta hejmareka din, înselâh dilê we geş û laşê we tendurîst be; mala we û hemû hezkirîyên we hezar û pênc sed carî ava be.

Eşref Keydanî





Ferhenga tematîk ya hasil û mitbexê

(Bajarê Agirîyê)

Ferhenga firaqan

Firaqên karê gundewariyê, li gor kar û barên gundan in. Ji ber ku karên gundan piranî li derveyî malê bi rê ve diçin, alav û firaq jî piranî metal in. Firaqên gundan pîr cure ne û her yek jî bi navekî taybet hatîye binavkirin.

Ferhenga hasilê

Kesên ku li gundan dijîn û heywanan xwedî dikin, pîranî jî xwedîyê heywanên mê bin, ji şîrê wan heywanan gelekî sûd werdigirin. Karê hasilê, kebanîyên malê dikin. Hasilgirtin, karekî zehmet û bi gav e, piştî kedeka dûr û dirêj karê hasilgirtinê temam dibe. Carina hasilgirtin di nava jinan da dibe sedema xwequirekirinê û dexesîyê jî. Ji ber wê, hin jin hasila xwe nîşanî kesî nadin, herweha hin jin jî, ji ber ku hasila wan zehf paqij e, di nava gundî da deng didin. Werhasil, karê hasilê karekî peydakirina xurekê resen be jî mixabin van salên dawîyê ji ber ku xwarinên hazir zêdetir berbelav bûne, mîna berê kes vî karî nake. Sedema vê yekê jî ew e ku jîyana rojane êdî ber bi bajarvaniyê ve diçe.



Çortan: Qatixê hişkkirî, ji bo zivistanê dihê veşartin.

Mînak: Golê, îsal ji bo xwarinê çortan kêr girtîye.

Dew: Mastê ku li gel avê dihê keyandin. Piştî keyandinê rûnê nivîşk ji ser dewî dihê girtin. Dew bihê kelandin dibe toraq.

Mînak: Xatûnê dewê xwe keland, toraqa xwe girt.

Hasil: Debara ku bi şîrê heywanan ji bo xwarina zivistanê dihê kirin.

Mînak: Li vî gundî kes mînanî Melekê hasilê paqîş nagre.

Îyar: Cihê ku toraq û penîr tê da dihê parastin. Ji postê mih yan jî bizinê çêdibe.

Mînak: Îyarê toraqa Helmê jî qilêrê nedihat xuya, xwelî li serê wan be.

Kil: Dehfa li sirsûmê dikeve.

Mînak: Xanim kilê wisa dide sirsûm gavek şûnda rûnê wê xweberê çêbibe.

Kila rûn: Ji rûnê ku bi pîvana her du destan tê kirinê ra dihê gotin. Gava ku rûn çêdibe kebanî bi her du destên xwe rûnî dike wekî gilokê, ji vê giloka rûnî ra jî “kila rûn”î dihê gotin.

Mînak: Şîrê îro pir bi berket bû, çar kilê rûn jê derket.

Hin gotinên pêşîyan

ji Anatolîya Navîn

Beroj Mukrîyanî

Xalan xelk in, apan mulk in.

Xal xerîb in, xelk in, dûr in; ap nêz in, wekî milk in û xwedî ne.

Gîya li ser kokê xwe dirize.

Kes, li esil û fesilê xwe diçe. Li malbata xwe diçe.

Heta kûsî nebe mîr, gevende nebe esîl, em keçê xwe nadine mêr.

Yanî em keçê xwe zû bi zû nadin her kesî; lazim e xwedî esilekî be, naskirî be û ne xirab be.

Hespî biçê, qamçî xwe nagîne.

Kesê karê xwe baş bike û xwedî xîret be ne hewce ye mirov zextan bidîyê, kar û barê wê/î bi bîr bixe.

Te qe cara dîye şew reş bûye, sibe rûnî nebîye.

Pîştî tarîtiyê ronahî ye, dawîya tengasiyê firehî ye.

Amadekar û berhevkar: Beroj Mukrîyanî

Zarbêj: Nêrgiz Baran

Temen: 35

Perwerde: Xwende

Herêm: Kûlû/Cihanbeylî/Haymana
(Konya/Enqere)

Dîroka berhevkirinê: Bihar/2020



Mazlûm Siyabend

Dosta ça, dujmina kwîr bike.

Dilê dostên xwe xweş bikin, lê bila dijminên we bi dilê we û rastîya we nizanibin û kêfa wan li ser we neyê.

Mere¹ li haspê xalkê nişt, ê zû paya ve.

Mirov pişt a xwe bide xelkê, dê tim li nivê rê bimîne.

Qûl vêqusûr² nave.

Mirovên bêqisûr tune ne. Kêmasîya her kesî heye.

Barê şûjinê di xa³ kute, paşê darzî di hevalê xe da kute.

Ewilî qisûr û kêmasîyên xwe baş bibîne, pişt ra bi qisûr û kêmasîyên hevalên xwe mijûl bibe û bide rûyên wan.

Jin jî gî⁴ jin in?

Her jin wesifê jinitîyê bi cih nayînin, yanî her jin ne wekî hev e.

Dest ser desta ra ye.

Yên ji hev xurttir, zanatir û dewlemendtir hene. Her kes ne wekî hevdu ye.

Ji baranê şûva, hespa cil meke.

A baş ew e berîya her tişt xira bibe mirov tev-dîran bigire.

Kurmî darê ji darê da newe, dar ger nawe.⁵

Pirsgirêkên mirovî, ne ji nava mal û malbat û merivên mirovî be, mirov zû bi zû nakeve û li ser hemdê xwe dimîne.

Kuçkik bi zorê bikşînî pez, xêra xwe nawe.⁶

Gava tu karekî bi zorê bi yekî bidî kirin dê tu

xêra wî karî tune be.

Kerê bi nefsa e, hewik⁷ ce⁸ ji wî ra bes e.

Kesên ku xwedîyê îradeya xwe û nefsa xwe ne bi tişteki biçûk jî qîma xwe tînin.

Derdî xizana nan e, derdî axa keyf û dilan e.

Xizan û yên hebûna wan tune ye li nanê xwe yê rojane difikirin, dewletî jî her tim li kêf û coşa xwe dinêrin.

Şêr şêr e, ne jin e ne mêr e.

Wêrekî û serbilindayî ne ji jin û mêranîyê ye. Ew taybetîyeka bi serê xwe ye.

Dest ê desta bişon, dest jî çava bişon.

Mirov bi alîkarîya hevdu û tifaqê hem ji bo xwe hem ji bo kesên dora xwe dikare bêtir bi kêr were.

Lawik ê çoyî bavkê, keçik ê teşîyê dayîkê dest xeke.

Mal mekteb e, keç û law didin ser rêya dê û bavê xwe.

Seva xatira naxim goştî qantira.

Ji bo xatiran mirov rêya xwe ya rast xera nake, dev ji rêzikên xwe bernade.

Qara⁹ ra mekeve bin bara.

Di kêliyên ku mirov diqehire da divê mirov bi eceleyî û bêfikir biryaran nede, dibe ku karê xwe xerabtir bike. Gotin û kirinên di wê kêlîya ji mirovî ra pişt ra dibin bar.

Mala merînî¹⁰ şûna zerînî.¹¹

Mala ku mêr lê hebin ango bi wateya ku xebatkar lê hebin debara wê xurttir e û dewlemendî lê heye.

1 mere: mirov.

2 vêqusûr: bêqisûr.

3 xa: xwe.

4 gî: giş, hemû.

5 ger nawe: ger nabe, nagindire, nakeve erdê.

6 nawe: nabe.

7 hewik: hebik.

8 ce: ceh.

9 qar: qehr, hêr.

10 mala merînî: mala mêr lê heyî.

11 zerînî: zêr lê heyî.

Ferhat Arslan

Gundê
Çîçikayê

Bêrivan Matyar

Biwêjên gundê Çîçikayê 2

Kirin nava dêzkî çilo: Li ser mirovên ku tiştên deradetî û dertoreyî dikin dihê gotin, bi maneya rezîl û riswakirinê ye. *“Xelkê em kirin nava dêzkî çilo.”*¹

Agir berdan û şewitandin: Dema ku mirov ne li bendê ye ku heval û naskirîyên mirovî, li mirovî bên xezebê û derban li mirovî bixin dihê gotin. *“Wê agir berî min da û şewitand.”*

Tu li vî alî teşîyê badidî, ew li wî alî teşîyê badide: Li ser kesên ku kar û gotinên wan li hev nakin dihê gotin. Her yek ji wan bi awayekî tev digere. *“Karê we pev nakeve. Tu li vî alî teşîyê badidî, ew li wî alî teşîyê badide.”*

Teşîya kesekê di serê kesekê da ristin: Li ser kesên ku ji tiştan ne berpirsîyar bin jî dikevin binê barê kirinên hinekan dihê gotin. *“Teşîya we teva di serê min da dirise.”*

Dar û werîs, Çîyayê Bedlîs: Ji bo rewşa mirovên ku tim dixebitin, mijûl in, nikarin serê xwe bixurînin û bi xwe dakevin dihê gotin.

¹ Eger ev kirin giran bibe, gotina “agir berdanê” jî lê zêde dikin û dibêjin, “Xelkê em kirin nava dêzkî çilo û agir berda.”

Zarbêj Wetha Matyar

“Dayê we çima qet dengê xwe qeyd nekirîye?”

“Qîza’m, me çi ji xwe fam dikir, em heta êvarê dişixulîn; dar û weris, Çîyayê Bedlîs.”

Qîra xwe tê dan: Ji bo kesên ku bela xwe bi kesekî didin, jê nagerin dihê gotin. *“Xano li dora te diçe û tê, qîra xwe bi te daye.”*

Eynî Qudo û Qumrî ne: Ji bo du kesên ku zehf ji hev hez dikin, tim bi hev ra ne dihê gotin. *“Ji hev pir bez dikin, eynî Qudo û Qumrî ne.”*

Xelk di çalan da keran dine, em diçin serê gazê: Hin mirov hene karên xwe veşartî dikin, ji kesî ra nabêjin, hinek jî hene her tiştê xwe eşkera dikin. Ev biwêj li ser rewşa wan e. Li vir bêhtir gazin li ser yê ku karên xwe eşkera dikin e. *“Zarokên me nabin, xelk di çalan da keran dine, em diçin serê gazê.”*

Karê wê/i serşûştî ye: Ji bo kesên ku karên xwe baş dikin, paqij dikin, bipergal dikin dihê gotin. *“Ji berê da wisa ye; karê Songulê serşûştî ye.”*

Karê wê/i kelemkotîkî ye: Ji bo kesên ku karê xwe dilewitînin, bêpergal in, tu encameka baş ya karê wan tune ye dihê gotin. *“Dîwarê hewşa Ehmoyê Maşê dîsa pelişîye. Jixwe karî wî wisa ye; karê wî kelemkotîkî ye.”*

Dewleta bi serê xwe ye: Ji bo kesên ku bi gotina xwe dikin, tu astengî li ber wan tune ye û li tiştê naheyîrin dihê gotin. *“Îro nîn e, ji berê da Besyayê dewleta bi serê xwe ye.”*

Dê û bava ew nanîye dinyayê: Ji bo jinên pir xweşik dihê gotin. Pirî ku xweşik in tu salixdan ji bo wan tune. Qalibê xweşikîyê li wan nayê, ji bo wan kê mîne. *“Bûka mala Şîkê ewqas xweşik e, dê û bava ew nanîye dinyayê.”*

Nava wan pirî e xweş e, kerkî bikurtan tê da derbas nabe: Li ser kesên ku navbera wan ne xweş e bi tinazî dihê gotin. *“Erê law, nava wan pirî xweş e, kerkî bikurtan tê da derbas nabe.”*

Keran pêl guna nekirîye: Li ser rewşa ecelekirina mirovan dihê gotin.

“Şeverkîya xwe bikin û hê biçin.”

“Na, em ê biçin.”

“De bisekinin, kera pê li guna nekirîye.”

Ma ti porê reş ji wan ra spî nakî: Li ser rewşa kesên ku mirovan xweyî dikin, lê dê heta hetayê xwe nedin ber mirovan dihê gotin. *“Xwişka’m te heta îro xwe da ber zarokan, ma ti porê reş ji wan ra spî nakî!”*

Eynî wek pîvoka biharê ye: Li ser jinên ku zehf ter û ciwan; xweşik, nazik û narîn in dihê gotin. *“Leylayê, orta rojê li pey mîrekî ket. Wax wax! Heyfa wê eynî wek pîvoka biharê bû.”*

Vê kulê dike wê qulê: Li ser kesên ku axir û oxir bi ya xwe dikin û tu tiştê di dilê xwe da nahêlin dihê gotin. *“Jixwe Felemez yekî wisa ye, her tim vê kulê dike wê qulê.”*

Gûzê bi gilîkê dişkîne: Li ser jinên zor, pir jêhatî û ji heqê tiştan derdikevin dihê gotin. *“Gozê, gûzê bi gilîkê dişkîne.”*

Dîsa mocê te rabûne: Li ser lihevketina mirovan dihê gotin, mirovên ku pêl tên wan û bêhteng dibin. *“Xêr e? Dîsa mocê te rabûne?”*

Dar anî tevî şaxê: Ji bo rewşa anîna kesekî, tiştê ku tevî zêdehiya wê/i û tiştê ku pê ra tê, dihê gotin. *“Me çêleka bigolîk anî. We dar anî tevî şaxê.”*

Bi moxilê diçe avê: Li ser kesên ku ehmeq û kêmaqil in dihê gotin. *“Ma hûn bi Fexrî nizanin, bi moxilê diçe avê.”*

Berhevkar û amedekar: Bêrîvan Matyar

Zarbêj: Wetha Matyar

Temen: 60

Perwerde: Nexwende

Herêm: Gundê Çîçîkayê/Farqîn/Dîyarbekir

Dîroka berhevkerinê: 2016-2019

Şerbeta rihanê

Ji bo ku rihan rengê xwe bide û ava wê sar bibe heta du sê saetan li bendê bisekinin. Piştî ku şerbeta we sar bû, bi alî-karîya sivgêçekî şerbeta xwe dawerînin, ji bo ku çançê wê ji şerbetê veqete. Şerbeta xwe bikin silhîyekî û bikin sarincê, ji bo ku bicemide.



Asmîn Ūyanik

Pêşîyan, di germ û kelekela havînê da ji bo hênîkbûnê gelek rê û rêbaz dîtine. Yek ji wan rêbazan jî vexurek in. Şerbeta rihanê li Dîyarbekir û derûdora wê vexwarineka binavûdeng e. Navûdengê wê ne tenê ji ber tehm û ekla wê ya xweş e; rengê şerbetê, rengê gelek xweşik e, dema ku mirov çav pê dikeve ji rengê wê huba vexwarina wê dikeve dilê mirovî. Li gor dêya min dibêje “dema ku şekir pîr bi qîmet bû, şerbeta rihanê vexwarina axa û zengînan bû, lê şikir îro her kes dikare li mala xwe vê şerbetê çêbike û bi sihet û efiyet vexwe.”

Ji bo çêkirina şerbeta rihanê çi lazim e:

Qevdeka rihana teze.

Heşt bardax av.

Bardaxek şekir (ji bardaxê du tilî kêm).

Kevçiyekî xwarinê leymûndizî.

Çend ta naneya teze û qirneflî.



Çêkirina şerbeta rihanê

Ji bo bikele heşt bardax ava xwe di quşxaneyê da bidin ser agirî, li alîyê din jî qevda rihana xwe bidin destê xwe û hemû pelên wê jê bineqînin. Piştî ku we rihana xwe neqand, bikin kodikekê û bişon. Heta ku ava we bikele hûn dikarin rihana xwe di nava avê da bihêlin.

Dema ava we ya ser agirî kelîya, avê ji ser agirî hilînin û rihana xwe ya şuştî bikin nava ava kelandî, li pey rihanê şeker û leymûndizîya xwe jî bikinê û bi kevçîyekî li hev bixin, heta ku şeker û leymûndizîya we helîya. Ji bo ku rihan rengê xwe bide û ava wê sar bibe heta du sê saetan li bendê bisekinin. Piştî ku şerbeta we sar bû, bi alîkarîya sivgêçekî şerbeta xwe dawerînin, ji bo ku çançê¹ wê ji şerbetê veqete. Şerbeta xwe bikin silhîyekî û bikin sarincê, ji bo ku bicemide.

Dema ku li gor dilê we cemidî ji sarincê derxin û li gor daxwaza xwe nane û qirnefilê bikin nava şerbeta xwe û vexwin. Cihekî we pê neêşe.

Nîşe: Li gor daxwaza xwe hûn dikarin di şûna kevçîyekî leymûndizî da lîmonekê û di şûna şekerî da dimsê bi kar bînin. Lê dims rengê şerbetê diguherîne. Herweha li gor tehma devê xwe, hûn dikarin şeker û leymûndizîyê kêm yan jî zêde lê bikin.

¹ çanç: kespik, berma.



Giftûgoya Mîrê Bota û Axaokê Bêdarî

(Ji arşîva ‘Ebdureqîb Yûsifî’¹)

Berhevkirin: Mela Xelefê Bafeyî²

Latînîkirin, ferheng û nîşe: Hêmin Omar Ahmad

Dibê Mîrê Bota keça xwe da kurê Mîrê Hekarîya, belê vêre vêre keça Mîrê Behdînan jî ji bo kurê xwe xwest û di Cizîra Botan da daweta kurê xwe li dar danî û def û zurne hate lê xistin û giregirekê ‘eşîran di Burca Belek da berhev bûn.

Belê di nava dîwanê da Mîrê Bota pîrsa Axokê Bêdarî kir û gote xelkên civatê, “‘Eceba Axaokê Bêdarî zelamekî çawa ye?”

Hindikana bersiva mîr dan û gotin, “Mîrê min! Axokê Bêdarî zilamekî teredînî ye, bernakevê ku mîr pîrsa wî bikê?”

Mîr go, “De ka nexwe gazî Axaok bikin, bila duhmekê werê civatê, da ku ez hindek pîrsan jê bikim, ka Axaok wê çawa bersiv bidê, yanî ka we ye Axaok zelamekî teredînî ye yan ne?”

Belê, dibê hemen peyakî sivik rabû û çû gote Axok, mîr dixwaze ku tu duhmekê bê civatê, da ku hindek pîrsan ji te bike. Belê Axaok rabû hate civatê û pîrozbayîk ji bo mîr da. Belê, di nava civatê da mîr ev çend pîrsên he ji Axaok kirin, mîr go:

“Ev dahul çê dibêjê?”

Axaok:

“Demdeme.”

Mîr:

“Ma tu bi çenda yî?”

Axaok:

“Heta niha bi diwa bûm, bûme bi sîya.”

Mîr:

“Ma te zû nekêla?”

Axaok:

“Belê, lê Xudê nehêla.”

Mîr:



“Dûr û nêzîk çawe ye?”

Axaok:

“Dûr nêzîk bûye.”

Mîr:

“Dîwan temam e yan ne?”

Axaok:

“Kit û mat!”

Mîr:

“Min cí bo te hejend.”

Axaok:

“Belê, te xanê hesin çêkir, derê pola da ber.”

Mîr:

“Wek dûrebîn e?”

Axaok:

“Ne teredîn e.”

Herwiha dibê rojekî Mîrê Bota gote kewgîrvanê xwe ‘Elo, go:

“‘Elo!”

Go:

“Belê mîrê min!”

Go:

“Kewgîrî şuxlî kî ye?”

Di bersivê da ‘Elo go:

“Mîrê min kewgîrî şuxlê bitir û betala ye.”

Mîr go:

“‘Elo, bitir kî ne û betal kî ne?”

Di bersivê da ‘Elo go:

“Mîrê min, bitir ê wek te ne û betal ê wek min in!”

Ferhengok

Demdeme: Yanî dem dema te ye, ev du şahî ji bo te ne.

Bi diwa bûm, bûme bi sîya: Yanî bi du lîngan bûm, gopal jî me daye ber xwe bûme bi sê lîngan.

Lê Xudê nehêla: Yanî zû zewicîm, lê Xwedê zarok nehêlan.

Dûr nêzîk bûye: Yanî çavê min nuqsan bûne, dûratîyê nabînim, nêzîk dibînim.

Kit û mat: Yanî diranê min kit û mat mane.

Te xanî hesin çêkir û derê pola da ber: Yanî te keça xwe da kurê Mîrê He-karyayê û keça Mîrê Behdînanê ji bo kurê xwe anî, her du alî ketin destê te.

Dûrebîn e: Yanî Axaok rewşenbîr û zana ye, wekî dûrbînê ye.

Ne teredîn e: Yanî Axaok ne wekî van teredînên civatê ye.

(1) ‘Ebdureqîb Yusif, diroknûs û şûnwarnasê kurdan e. Niha temenê wî 80 sal e û 60 sal in xizmeta folklor û dirok û şûnewara Kurdistanê dike. Îsal pîranî arşîva xwe xist ser malpera înternetê û heta niha bi mezintîrîn malpera şexsî tê hejmartin.

(2) Mela Xelefê Bafeyî (-1993) şagirdê Seyda ‘Ebdureqîb Yûsîfî bûye û di navbera salên 1970-1990î da gelek kereste-yên folklorê xirve kirine û bi çend defteran jî seydayê xwe ra şandine bajarê Silêmanîyê.

Çavkanîya arşîvê
<https://abdulraqib.net/>

Qaydeyê xerîbê
ji Qelqelîyê*

Mehmet Yildirimçakar** ▶



Ferhengoka Agirîyê

Firat Keklîk



Zarbêj: Sînem Keklîk

Alang:

n. z.>m

Hatin û çûyîna di nava mal û kar û barî da. Ji paqij yan jî nepaqij tevgerînê ra dihê gotin.

Mînak: *Tu yê jî bêjî alanga min alang e, erê?*

Alofe:

r. z.>nt

Heywanên ku zehf alifî dixwin.

Mînak: *Wê salê du çêlekê me hebûn, pêka debarê nedihat, wisa alofe bûn, tişteki nedîtî.*

Ava golî:

r. z.>nt

Ava şîrogermî, ava ne sar ne jî germ.

Mînak: *Zivistanê ava golî vexwe, bila gewrî-ya te newarime.*

Baborîbûn:

l. z.>m

Ba+buhurî, surlêxistin, cemidîna zexîreyê.

Mînak: *Di balqonê da penêr û toraqa min va baborî bûye.*

folklorame

Berexêrî:

n. z.>m

Ber bi xêrê, çûyîna bûyer û qewimînan ya ber bi başîyê ve.

Mînak: *Şikur di rewşa wî da berexêrî heye, êdî gumana me Xwedê ye.*

Boxeçor:

r. z.>nt

Ji bo mêrên jêhatî dihê gotin. Ji mêrên ku zehf jêhatî û wêrek ra dihê gotin.

Mînak: *Şeş bira ne, mînanî şeş boxeçoran.*

Dêrizbûn:

l. z.>m

Mehfkirin, ze'îkirin.

Mînak: *Gihê berav ke, bila di dest pîyê dêwêr da dêriz nebe.*

Gerev:

n. z.>m

Bela, bûyer, qewimîn.

Mînak: *Lawo, ji xwe ra bi aqil bin, ev ne dew-
ra berê ye, êdî ji her maleka vî gundî derdike-
vin sed mêr, xelqê nexin gereva xwe vê bihara
ban.*



Tizba mîr

Ez kîrim hêstir, bîjîyên mi gir-
tin, ez derêxistim ji derve, go
de vêca here! Derket'j derve,
go: "Hey hêêê! Ev hêstira ha ya
min e. Heçî bibê aşî, heçî bibe
dara, heçî bibe kuça, kê kû ve
bibê bila'j xwe re bibe. Ka çi
barê kê hebê, bila pê biqedîne"
Wile mi dî'j wê ve yek hat,
hevsarek da ser mi, ez birim
kurtan kîrim, du ciwal zad li
mi bar kîrin û berê mi da êş.
Heta e'j êş zivîrim, mi dî wê
sê çar kes ketîn dorê. Yekî ez
birim dara, yêkî ez birim kuça,
yê din çopa mala xwe da pişta
min, bir valekir. Yekî bilonî-
ya (binolî) pez û dewarê xwe
paqij kir û ziblê wê da pişta
mi û bir sergo de rijand.



Kurdjan Sorî



Carî cara, rehme'l dê'w babê hazir û guhdara.

Heçî mîr e, mirovek zehf baldar e û zehf ha'j îş û karê xwe heye. Her wextî karker û xebatkarê xwe, anko me'mûrê dewletê kontrol dike. Li nav millet digêrê, ka çi xwestek û gazindê millet hene, guh didêrê û welhasil ha'j milletê xwe dimînê. Rojkî dibêjê wezîrê xwe, dibêjê:

“Ciwabekî bide seys û mehtera, bila îşev îm û alifê hespê me zêde bikin, heta dazdeh yekê şevê û em ê derkevin teftîşa bajêr, ka çi heye, çi tine.”

[Wezîr] go:

“Belê mîrê min.”

Rabî, axir emir da seys û mehtera û wile îm û alif dan ciwanîyê wan û çawa saet bî yek, ciwanîyên wan li ber wan hazir kirin û go:

“Ezbenî va ye dewarê hewe hazir in.”

Ewan jî herkî destî cilê derwêşan li xwe kirin û derketin teftîşa bajêr. Her do li hespê xwe siwar in û hêdî hêdî dimeşin. Qederkî çûn, ciwanîya mîr veciniqî û destî tizbê dur in, ka yaqût in ji deste mîr beyîn¹ û ketin. (Hingê ceryan jî tine, ronahîyên wan ka çira ne, mûm in çi ne? Axir.) Mîr li wezîrê xwe fitilî, go:

“Wezîr, ka peyar be. Xêra xwe va tizba bide min.”

[Wezîr] go:

“Çire ti peyar nabî, tizbê xwe hilnadî?”

[Mîr] go:

“Wezîr, e(z) mîr im, ti wezîr î. Lazim e ti peya bibî, ne heqê min e ez peya bibim.”

Go:

“Wile e peya nabim. Peya be, tizbê xwe bîne.”

“Aaa, wezîr ti zêde diçî, filan! An ti seryan'j min dikşînî!?”

Welhasil bî munaqêşa wa, rabî wezîr go:

“Mîrê min.”

Go:

“Kerem ke.”

Go:

“Mîrê min, wilehî ka'j min û te kê mu'cizayê

¹ beyîn: pekîn.

mezin hatine sêrî, ew ê siwar bimîne û yê hindik hatî sêrî, yê peya bibe û tizba hilde.”

Mîr ma heyrî û got:

“Wezîr, her tê peyar bî. Vêca hema niho peyar be û xwe xilas ke.”

Wezîr go:

“Ez peya nabim.”

Mîr go:

“De nexwe bêje, ka çi hatîye serê te?”

Wezîr des serpehatîya xwe kir û got:

“Mîrê min, babê te mîr û babê mi jî wezîrê babê te bî. Hewqas ez xortî taze bîm -niho jî, vî emrê he de, e'j xortê vî zemanî zehf tazetir im, spehîtir im- vêca babê mi, destî cilê zêr û zîv'j mi re çêkir bî, dabî çêkirin. Îşê mi xwendin bî. Vêca e zanim herim meytebê û werim malê. Başqe nizanim herim ti derî. Zeman derbas bî, e jî mezin bîm, bîm mêr. Rojkî dîya mi got mi: “Kurê mi, ti hatî vî emrî te dîwanxana babê xwe nedîtîye. Lazime tu herî diwanxana babê xwe, millet jî te nas bike, te bibînê. Bizanibe ka ti kê yî û tu kurê kê yî.”

Mi jî go belê û ez rabîm, min cilê xwe li xwe kirin û ez derketim zikak û kolanê bajêr. Ez vê taxê re çûm ya di re derketim û mi kolenek li pey xwe hişt, ya di da pêşîya xwe û mi nizanîya hêdî e'l² kû me. Ji mi re gotîye dergehê mezin e û li ser derîyê wê DÎWANXANE dinivîse. Dil xwe de (qaşo) ez xwenda me jî, dê'l hir, dê'l dera ha ne, pa ne hê ez çîqa li dora xwe direnim, e'l xanîya direnim filan, her kesi serê xwe derêxistne kulek û pencerê xwe re, darî mi'dkin, anko darî cilê mi'dkin. Cilê mi wey likusê şe'le didin. Welhasil, e çûm, li zikakkî baketim, mi rênî pîrî ket ber bedena mi û'l mi rênî û got:

“Tu ne kurê wezîr î?”

Mi got:

“Belê.”

Go:

“Tê çî'bkî?”

² e'l: ez li.